

Ihre Rechte zählen – EU Survey of Immigrants and Descendants of Immigrants



Kurmancî - Pirsên ku pir caran têne pirsîn

Ew rapirsîn li ser çi ye?

Ew rapirsîn agahiyan li ser tecrîbe û nêrînên kesên xwedî bingehek etnîkî an koçber ji Tirkîye, Afrîkaya Bin-Saharî, û Sûriyeyê kom dike. Em eleqedarê tecrîbeyên we yê rojane di warên curbecur ên jiyânê de ne mîna kar, tenduristî û xanî, û her wisa vê yekê ku gelo we hîs kiriye ku bi cudakarî an bi dadperwerî bi we re hatiye reftarkirin. Ew rapirsîn li 15 welatên Ewrûpî tê kirin.

Kî vê rapirsînê birêve dibe?

Ev rapirsîn ji aliyê Statistik Austria li ser navê Ajansa Yekîtiya Ewrûpa ya Mafên Bingeîn ve tê kirin.

Ajansa Mafên Bingeîn (FRA) çi ye?

Ajansa Mafên Bingeîn a Yekîtiya Ewropî (FRA) li Viyana, Awistîrya ye. Ajans alîkariya saziyên Yekîtiya Ewropî (YE) û Dewletên Endamê YEê dike da ku mafên hemî mirovan bêne rêz kirin. Lêkolînên borî yê Ajansê bûne alîkar ku rewşa gelek mirovên wekî koçber, zarok, qurbanîyên cebrê û Romayê baştir bibe. Ji bo agahiyên zêdetir, serdana <http://fra.europa.eu/> bikin

Çima ev rapirsîn girîng e?

Li ser vê yekê ku mirovên ji kêmnîyên etnîkî û civakên koçber çawa mafên xwe bi kar tînin û gelo ew difikirin ku mafên wan têne rêz kirin agahiyên kê m hene. Encamên rapirsînê dê alîkariya siyasetmedaran bike ku pirsîrêkên herî lezgîn ên çareseriyê bizanibin, da ku ji her kesî re dermankirina wekhev misoger bibe.

Kî dikare beşdarê vê rapirsînê bibe?

Em dixwazin bi kesên ku li Awistîrya dijîn û eslê xwe ji Tirkîye, Afrîkaya bin-Saharî an Sûriyeyê ne an herî kê m yek ji dayîkûbavê van li van welatan/herêman hatiye dinê re hevpeyvîn bikin. Me we bi bêpayîn hilbijart û kesek din nikare were şûna we, ji ber ku ev ê encamên rapirsînê bi alîgir bike.

Ez kengê dikarim beşdar bibim?

Gava ku hûn nameyek ku koda weya gihîştinê tê de ye werdigirin, hûn dikarin biçin www.statistik.at/onlinebefragung ji bo vekirina rapirsîn. Ji kerema xwe berî muhleta ku di vexwendnameyê de hatî destnîşan kirin yekser bersiva pirsan bidin.

Dê kengî encam werin weşandin?

Encamên pêşîn ên rapirsînê dê di dawiya 2022-an de werin weşandin û dê li ser malpera FRA-yê hebin: <http://fra.europa.eu/en>.

Ez çawa dikarim bona xwe daxwaz bikim?

Piştî temamkirina rapirsînê, em ê ji we re 10€ bona diyariya we bi postê bişînin.

Ez çawa rapirsînê tekmîl bikim?

Koda têtetînê ya ji bo temamkirina rapirsînê dê nava vexwendinnameya ku we li ser rapirsînê de wergirtiye were çap kirin. Ji kerema xwe biçin www.statistik.at/onlinebefragung û kodê di qutîkê de binivîsin.

Ez dikarim di dema tekmlkirina rapirsînê ya serxet de hinekî bêhna xwe vedim?

Belê, dema ku rapirsînê online tekml dikin, bersivên we piştî her pirsê jixweber têne tomarkin. Dema ku hûn bixwazin hûn dikarin bi pirsnameyê re pencereya gerokê bigirin - dê bersivên we werin tomarkin.

Heya kengê ez dikarim rapirsînê tekml bikim?

Ji kerema xwe rapirsînê di dema herî zû de ku hûn dikarin tekml bikin,

Dê tekmlkirina rapirsînê çiqas bidome?

Tekmlkirina rapirsînê bi qasî 45 deqeyan didome. Zanînên taybetî ne hewce ne.

Gelo ez ê di encaman de bême naskirin?

Na. Bersivên we dê bi yê kesên din ku beşdarî rapirsînê dibin re têkildar in û dê tenê daneyên bênav ji bo raporê werin bikaranîn. Bersivên komên bersivdêran ên ew qas biçûk ku kesek were naskirin, dê ji hev cuda neyê weşandin. Rayedarên bacê an koçberiyê an sepandina qanûnê nikarin bersivên we bibînin.

Kî dê agahdariyên min bi dest bîne?

Agahiyên pêwendiyê û bersivên pirsnameyê ji aliyê Rêveberiya Statîstîkên Awstrya yê ve têne berhev kirin. Piştî ku agahdariya pêwendiyê we jêbirin, FRA, ku ev rapirsîn daxwaz kiriye, dê daneyên nenas werbigire.

Daxuyaniya parastina daneyan

https://www.statistik.at/wcm/idc/idcplg?IdcService=GET_PDF_FILE&dDocName=127419

Pirsên bêtir

Eger alîkarî hewce be telefon bikin an jî mailê bişînin.

Telefon: (01) 71128 8993 (Duşem heta Înî 9:00- 15:00)

Îmeyl: miteinander@statistik.gv.at